

LI H E S E K Ê .. K R Î Z A K E H R E B Ê



PEYVA WELAT

Zarê Kurdî û Roja Zimanê Makê

Desteya sernivîs

Zar û ziman yek ji hêmanên hebûna gelan e. bi tinekirina zar û ziman re gel jî tine dibin. Hebûna gelan netenê hebûneke fîzîkî ye, hebûna fêzîkî ji gelan re têrê nake ku em bibêjin ev gel heye. ji ber ku gel bi taybetmendiyên xwe yên çandî tene naskirin, çand nasnameya gel e, û zar û ziman hilgirê çanda gel e.

Wate; eger ziman û zarê miletekî lawaz bibe û ber bi nemanê ve biçe, ew millet jî ber bi nemanê ve diçe.

Ji lewra, her dem dijminên gelê kurd li ser du astan şerê xwe yê taybet li dijî vî gelî dimeşînin, ji hêlekê bi riya komkujî, koçkirin û guhertinên demografî dixwazin hebûna gelê kurd ya fîzîkî lawaz bikin, ji hêla din ve şerê çand û zarê kurdî dikin.

Ji mafê her mirovekî ye ku bi ziman û zarê xwe yê makê bixwîne û biaxive, ev maf di hemû zagon û yasayên olî û navdewletî de û di lîsteya mafê mirovan de hatiye parastin. Lê ji bo gelê kurd, ta vê demê jî ev maf ji hêla rêjîmên desthilatdar ve bi rengekî eşkere tê binpêkirin û hewldanên bişaftina gelê kurd berdewam dikin.

Parastina zar û ziman yek ji xebatên bingeşîn û pir girîng e, û ji bo her kesê ku ji bo hebûna xwe kar û xebatê dike erkeke netewî ye.

Wek ku tê zanîn, zimanê kurdî bi sedê salan di bin barê qedexekirin û şerê taybet de maye, di encamê de ziyaneke pir mezin dîtîye, û rewşa zimanê kurdî gihiştibû asteke pir xerab û metirsîdar. Di heman demê de û bi saya wê çand, kultor û gelpora gelêrî ya kurdî ya zengîn, dewlemend û resen li ber xwe daye.

Ev tenê têrê nake. Ta ku ziman bibe tekûz û metirsî li ser nemîne, divê ew ziman bibe zimanê xwendin,

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerfina xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com


www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

nivîsandin û hizirandinê. Îro roj hewldanên pir baş di vî warî de tene kirin û tevgereke zimanî ya pir girîng lidar e. bi taybetî li başûr û rojavayê Kurdistanê. Gavine pir girîng û balkêş tene avêtin, zimanê kurdî bûye zimanê xwendinê û derbasî dibistanan bûye, ev gaveke pir pîroz û durist e, lê hîn jî rastî gelek astengiyan tê. Divê ev gav berdewam bike û li ser were avakirin. Divê baweriya gel bi zimanê wî ji wilo xurtir be, divê nîşekî kurdî were avakirin ku bi zimanê kurdî bixwîne, binivîse û bihizire. Divê han bi vî bizav û rabûna zimanî ya girîng were dan.

Bi boneya roja zimanê makê ya cîhanî, ji her mirovekî kurd tê xwestin ku fêrî zimanê xwe bibe, xwedî lê derkeve, bi zimanê xwe bixwîne, binivîse û bihizire. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

KAWA NE HESINKAR E



Cindiyê Xizan

Beşa 1

Di nav rûpelên dîroka bêbext de, mîletin tev li welatê xwe, di qorzikên teng, û tarî de wendayî mane, yek ji wan mîlet û welatan Medî bûn. Pêwiste xwendevan, û nivîskarên kurd, dasîtanên Somriyan bixwînin, dê bi dehan navên xwedad, û tiştên ku hêta nuha em bi lêv dikin, û bi kar tînin, wê di ser wan re derbas bibin, mîna "Înana", xwedada jîn, û çandiniyê bû, û ew nan bi xweye, û yezdan "Gor" xwedad, û berpirsiyarê mirin, û goristanan bû, û "Memo" dûmana ser riwê çema ye, û "Abso" ava kanîya şor, ya ji nava zemînê dipejiqe, û "Merdok" xwedanê cot, û çandinî, û merkîrîna zemînê bû, û her wiha em çiqasî, paş de vegerin dîrokê, em ê huqasî, reha hebûna xwe di nava dîrokê de, kûr bibin, îdî em ê xwe baş, û rast nasbikin.

Lê Efsanenas, û dîrokzan li gorî nasîn, û ûjdanê xwe, hin dibêjin zarê mîletê Medî Hindoropî ye, û hin dibêjin Farisî ye, û hin dibêjin Arî ye, lê hinek jî dibêjin Medî ne ji tu kesî ne, lê neviyên Kûtî û Kardoxiyan ne, û zarê wan ji tevliheviya zarê Kûtî, Lolî, û Xoriyan e, û bavê kurdên nuha ne, ji lewra kurdên demê pir pesindar, û serbilind in, ku ew ji mîletê Medî ne.

Her wekî me naskir ku zarê Medî ew bingeha zarê kurdên nuha ne, pêwiste em nasbikin bê kurd ji ku hatine, û li ku bi cî bûne, û li ku jiyan kirine.

Lê berî vîna pêwiste em zanibin bê gotina kurd

ji ku hatiye, û li ku bi cî bûne

Kurd man li cî:

Her wekî em dizanin, ku çîroka heyîna kurdan, ne hew ev çend gotin, û hevok in, lê ji bo anînê, û dolmendkirina, bîr, û rava Xwendevanên kurd ez dikarim bibêjim ne wek ku hinek ramangêr, û nivîskarên cîhan, û heremê dibêjin, ku kurd, Erb in, Faris, û îranî ne, û hin dibêjin kurd Hindoropî ne, û hin dibêjin kurd kurê Cinan in, û her weha.....

Lê hey em vegerin, dasîtanên Someriyan, em ê li mezintirîn çîroka gerdûnî, ya lehiya peyamber "Nûh" rastbên.

Ji mêj de, ji her kar, û bûyerekê re xwedadek hebû, lê piştî mirov pîrbûn, û hew bi ya xwedayê xwe yî xuristî "tewtemî" kirin, xwedadê "pansiyonê" Enlîl → Avlîl (bi zarê Somerî, ava Şelû ya ji serê çîyan diherike), ji rewş, û xemsariya mirovan ji xwedawendan re, pîr xêşim bû, bi femandariyekê, xwedadên xuristê tevde civandine, û bi hev re gihiştin raveke giştî, û biryara, ku celebên mirov, û dunyayê pê re, bi mezin lehiyekê noq, û tune bikin, dan, lê ji nav xwedawendên "pansiyonê" xwedaa "Enkî → Kanî" (Bi zarê Somerî, ew ava ji bin zemînê der tê) di nava xwe de pîr xêşim bû, û dilê wî gelekî, bi vî biryara li ser tunekirina mirov, û tinawerên dunyayê, êşiya.

Bi lezgînî, û dizî, xwe gihand mirovê gemîvan, yê çê, û baş, "Atnapiştîm"- "Nûh" bû, û razên civîna "pansiyonê" jê re eşkere kirin, û ew şîret kir, ku gemiyekê mezin çê bike, ji bo zindî, û tinawerên jiyanê jî di gemiya xwe de hilgire, û wan bi xwe re, ji nemanê biparêze.

Nûh, gemiyek mezin çêkir, ew, û xanima xwe Ferha, û sê kurên xwe Sam, Ham, û Yafis (dibe ku Hîm, û Sîm, û Lavij be...Daner)- û xanimên wan - tevde heyişt kes bûn- û ji her celebê tinawiran cotek nêr, û mêyek bi xwe re, di gemiyê de bar kir.

Xwedawend Avlîl, fermana tunebûnê da ewrên ezmanan, û baraneke xurt bi zirpîn, barand, av li hev xist, lehiyê herêm tevde noq kir, lê Nûh bi gemiya xwe bi ser avê ket, cî li ser quntera çayê "Agirî" dît, û li ser rawestiya, hêta ku ava lehiyê vegeriya mîna rewşa berê, Nûh kevok firand ji bo salox, û nûçeyên lehiyê jê re bîne, kevokê piştî çend caran bivegera xwe re, şaxek ji dara zêrtonê (zeytûn), bi nikilê xwe jê re anî, pîr şa, û dil rehetî bû, di pişt re fermana daketîna da, tevde ji gemiyê

daketin, binya çayê Agirî û li wir gundek ava kirin bi navê “Heyîştîyan- li gorî kesên ji gemiyê peya bûn- bê gûman ew kes kurdên cî bûn, ji ber vê yekê navê wan bû “ kurd man li cî “ û hino hino ev hevok kurt bû, tîpa “d” ê ji gotina kurd hat avêtin, û her weha, daçeka” li” jî, ji hevokê hat avêtin, hevok kurt bû, û bû (kurmançî)

Ji wî heyamî de, navê kurdên herêmê, ma kurmanç, û navê çayê Agirî bû Cûdî, û ji wî heyamî de, kevok bû şana aşitiyê, û şaxê zêrtonê jî, bû şana felatê.

Lê Avlîl ji bo vê biryara şaş, ku dunya û zindîwerên tê de tev de tune kir, pir poşman bû, îdî soza ku hew biryarek wiha bide da, û nîşana soza wî ew keskesora gerdûnê ye, ji lewra milletên herêmê rengên kesk, zer, û sor jî ji xwe re kirinin al, û beyraeqa felatê.

Pîştî me cîh û war û resiniya kurdan naskir îdî em ê vegerin milletê Medî

Medî:

Her wekî me nas kir bê kurd ji ku bûn, û li ku bi cî bûnin, îdî em ê vegerin kok, û rehên Imperatoriya Medya ya bi hêz, û nav û deng.. mixabin hinek vekolîvanên kurd dibêjin ku wateya gotina med ji wan kesên ku di çîyan de jiyan dikirin tê gotin, û hinek dibêjin ji amadiya hatiye, lê Misrî yên Feronî ji wan re digotin mdeyî û (keye)

Ji ber sîstema ferweriya wan sîstema Umdeyî bû (keye)

Hin dibêjin ji gotina Neyarî hatiye, an ew kesên bê dost.

heger birra Medî bê dost û heval, û bê xwedî, û piştgir biwana, îdî çawa her êlên ku setemkariya sîstema Aşûriyan li ser wan zor fikir destê Mad a girtinin, û alîkarî, û piştgirî danin wan, û tevda bi hev re, sîstema Aşûriyan roxandiye, û xwe ji setemkariya wan felat kirinin.

Lê navê wan di Tewratê de hatiye NeAram (ew kesên bê Hedan, yên pir çalak : Daner.

Medî kî ne ..?

Medî di dawiya çerxa 8 an berî zayînê memleketa xwe damezirandin, Di destpêkê de her êlek ji êlên Medî dadweriyek biçûk ji xwe re çê kiribû, lê ji ber setemkariya Aşûriyan hinek êlên din wek Parsî, ku mervantî di navbera wan û medîyan de hebû, xwe xistin bin siya ferweriya Mediya de, ber bi wan ve hatin, û xwe dan ser hev, û xwe bi hev re bi hêztir kirin, û bajarê ku di romanên Hîxamênşîyan de bi nav bûye “Hingamentan an Hemedan “(dibe ku gotina Hingamentan ji gotina Hingame hatibe, û Hingame bi zarê kurdî sert – reqî an ew kesê qesp tê: Daner) û (hemedanê ji Umdeyanê hatiye, an cê civîna Umdeyên êlên medya: Daner) ji xwe re kirin paytext..

Medî milletê herêmê ne, ne ji tu deverê hatinin, û ew kurdên resen yên herêmê ne, û zarokên Gûtiyên merd û cegerdarin, û di kedî kirina dewar, û çandinî, zêr, bironz, kehreba, û di zanebûna avahiyan de kar dikir.

û pirtûka pîroz, bi navê (Vêdas → vêda, an meznahî – payedarî :Daner) û bi zarê Sensekrîtî li dû xwe hiştin, û Vêda li ser rola dîrokî ku milletê Medî tê re buhiriye diaxife..

Li gor Aşûriyan di nivîsên xwe de tewat kirinin, ku milletê Medî, miletekî hêzdar, û cegerdar bû, û ji hinek êlan pêkdihat, û hemû êl ne di bin ferweriya dadêkê tenê de bûn, lê her êlek Ûmdeyê (Keye) wê başqe bû.

Lê dîroknasên wî heyamî, û bi taybet nivîskarên Farisî yên mîna (Muşîr El Dewle El îranî “pîrviya” yê ku di pirtûka xwe de di sala 1300 zayînê de, bi wan ramanên xwe yên Şofînî Îranî nivîsandiye, û tê de her tiştên Medî kirinin yên Farisî) her tiştên Memleketa Medî bi navê xwe nivîsandin, heta bi Keye (Asta Yax), kirin Ejdehakê Aşûrî ji boyî dîroka miletekî bi giştî çewt û tune bikin..

Heger em vegerin gotinên Misrî yên Feroonî, Emadî →Umdeyî. (û gotina Umde bi zarê Misrî ew kesê ku gelek tiştan sipartî wî dibin, û wateya wê bi zarê kurdî tê Keye :Daner)

Li gorî Efsanenas dibêjin, ku keyak di gundekî de ji gundên Medya de, navê wî Dêyoksis → Dêyok → Dêw bû...(Dêw :bi zarê kurdî, wateya afirît dide, û Afirît ew kesê ku zanibe tiştan biafirîne: Daner) ■

(أوركيش) وعلاقتها مع مملكة أكاد



رضوان محمد

الموقع:

أوركيش: المكان المعروف الآن باسم تل موزان، ويقع على مسافة ١٧ كم غرب مدينة القامشلي على الطريق الذي يصلها بعامودا على بعد ٥ كيلومتر إلى الجنوب الشرقي منها، وتقع شمال مدينة الحسكة بنحو ١٠٠ كيلومتر، ويعد أكبر المواقع الأثرية السورية في حقبة الألف الثالث قبل الميلاد. تل موزان هو الموقع لمدينة أوركيش القديمة - وهي معروفة في التاريخ، ويعيدون بداية تأريخ عمرانها على الأقل إلى بداية الألف الرابع ق.م. والتي أصبحت فيما بعد المركز الأساسي للحموريين، وهو المكان الذي عاش فيه أب الآلهة، كوماري.، الذي احتفل به في أساطيرهم، وكانت أيضاً عاصمة المملكة التي كانت تسيطر على المرتفعات إلى الشمال، والتي كانت تحوي على مناجم النحاس، مما جعل منها مدينة غنية في تجارتها وتبادلاتها.

والآن، يبلغ طول التل ٧٠٠ متراً، وعرضه حوالي ٤٠٠ متر، وارتفاعه عن السهل المجاور حوالي ٢٠ متراً، وتبلغ مساحة التل المركزي الداخلي نحو ٣٠ هكتاراً. ويمتاز شكل هذا التل بأنه يختلف عن كل التلال الموجودة في المنطقة، ويتألف من سبعة تلال متلاصقة، يحيط بها سور ظاهر للعيان.. فمع النمو السكاني اتسعت المدينة التاريخية في تل موزان لحدود

جديدة، فبنى أهلها سوراً ضخماً جديداً منتصف الألف الثالث قبل الميلاد، ولم يعد يستخدم السور الداخلي الأقدم، لتعود مع نهاية الألف الثالث قبل الميلاد للتقلص مجدداً في حدود التل الحالي، خلال الألف الثاني قبل الميلاد.

ويتربع على قمة التل المعبد العالي الذي اكتشف في أول موسم تنقيب عام ١٩٨٤، وهو معبد صغير نسبياً بني على ارتفاع حوالي ٢٧ م فوق مستوى السطح الأصلي للمدينة القديمة، وقد أرخه علماء الآثار بحوالي ٢٣٥٠ ق.م. وتم التعرف في المعبد على المصطبة المبطنة بالحجارة التي خصصت للعائلة الملكية ويعمل العلماء محافظة جدران المصطبة الملكية على حالتها الجيدة جداً باستمرارية استخدامها حتى أواخر فترة سكن /أوركيش/ القديمة وصولاً إلى المرحلة /الميتانية/ التي شهدت تقلص المستوطنة القائمة إلى حد مساحي متواضع جداً إلا أنها بقيت محافظة على مكانتها المهمة كمركز ديني في المنطقة. وفي المرحلة /الميتانية/ شهد المعبد انجرافاً كلياً فيما بقيت المصطبة على الارتفاع نفسه الذي هي عليه الآن. ويعد قصر /توبكيش/ من المعالم الأخرى المهمة التي تم اكتشافها في تل موزان ويتألف من مستويين خصص

المكتشفة في أوركيش أن عام ٢٥٠٠ ق.م هو الزمن الحقيقي لنشأة الحضارة الحورية.. حضارة عصر البرونز القديم .

تكوين القصر الملكي لأوركيش :

يتكون القصر الملكي في أوركيش /العاصمة/ من ثلاثة أقسام، بدت واضحة بشكل جيد وهذه الأقسام هي قسم الخدمة، والديوان، والجناح الملكي.. و سنتناول شرح كل قسم منه على حدة،

قسم الخدمة : ويتألف من ست غرف تطل على فتحة سماوية /فناء/ وتتصل من الشمال بمدخل يصل إلى باحة تطل هذه الباحة من الجهة الشمالية على أرضية مرصوفة بالحجر و ضمن الباحة في الزاوية الشمالية الشرقية يوجد مستودع صغير تم العثور فيه على العديد من طبقات الختم -والتي سنأتي على شرح دورها لاحقاً- و يوجد أيضاً مطبخ كبير يتوسطه تنور يصل المطبخ من الشمال عبر باب او مدخل على الأرضية المرصوفة بالحجر، وفي الزاوية الشمالية الغربية من المطبخ يوجد أيضاً مستودع صغير آخر مناظر للمستودع الأول وجد بداخله العديد من طبقات الختم التي تعود إلى الألف الثالث قبل الميلاد .

أما الأرشيف يتكون من غرفتين متصلتين ببعضهما يتوسطهما /إيوان/ وهي فكرة هندسية قوية تؤكد وجود حضارة معمارية عريقة، والإيوان مطل على فتحة سماوية عثر بداخل الإيوان على مصطبة، يعتقد أنها كانت للكتابة على الألواح الطينية، والأختام، بالإضافة إلى غرفة وجد بداخلها حفرة مدرجة بالقرميد و متصلة بقناة تصريف، وغرفة صغيرة أشبه بالممر، كانت تصل بين المطبخ، وقسم الخدمة و الديوان، أما الغرفة الثالثة المشابهة بحجمها لبقية الغرف الرسمية فقد كانت تصل بين قسم الديوان و القسم الملكي .

الجناح الملكي : تم العثور على غرفة مستطيلة الشكل لها باب من الجهة الشمالية، ويرتفع بدرجة واحدة و يطل على باحة مكشوفة و مرصوفة بالحجر بشكل رائع، والذي لا يزال محتفظاً بتناغمه و قوته دون أي تأثير، يرتفع القسم الملكي عن بقية الأقسام الأخرى بثمان درجات، أما بالنسبة للغرفة المستطيلة، فقد وجد جزء من جدارها مطلي بمادة / الجص / وتم الحفاظ عليه بتغطية تلك الزاوية بالزجاج من قبل البعثة المنقبة، وعثر في وسط تلك الغرفة على طبقات لختوم.. تعود بتسميتها إلى تارام أكاد ابنة الملك الأكادي نارام سين .

بعد هذه المرحلة من الاكتشافات للقصر بأكمله، تم العثور

المنخفض للخدمات ويحتوي على المطبخ ومخزن للمواد التموينية الخاصة بينما خصص مستواه الأعلى للملك وعائلته ومنه أديرت شؤون الحكم في تلك الحضارة فيما ما زالت البعثات الأثرية تحاول حتى الآن التعرف إلى باب القصر ومدخله الرئيسي. واسم تل موزان غير حديث، فقد أورده ابن الأثير في أخبار فتح رأس العين. ويذكر ياقوت الحموي أنه بلد قديم يقع بين رأس العين وسروج^١، بينه وبين رأس العين عشرة أميال، ويعرف التل بتل المال^٢.

في عام ١٩٣٤ قام الإنكليزي ماكس مالون M.Mallowan بأعمال سبر محدودة في التل، وذكره باسم (موزن) وكان ينوي التنقيب فيه، ولكنه اختار العمل في موقع (شاغر بازار)، لأن زوجته (أغاثة كريستي) لم يطب لها السكن فيه.

هذا، وتم التنقيب فيه منذ عام ١٩٨٤ من قبل البعثة الأمريكية التابعة لجامعة لوس أنجلوس برئاسة الباحث الأثري الأمريكي جورجيو بوتشلاتي وزوجته الباحثة مارلين كيلى في هذا التل الأثري بمساحته، وامتداد لحدود المدينة الخارجية قطرها يبلغ ١٥ كم، مشيراً إلى أن التنقيبات كشفت عن عدة سويات تعود للألفين الثالث والثاني قبل الميلاد متلاصقة يحيط بها سور عظيم يضم بين جوانبه أطلال /أوركيش/ العظيمة وهو أول عاصمة للحوريين في الجزيرة السورية.

وقد وجدت تحارير كثيرة موجهة إلى - أمنحوتب الثالث - وإلى - أمنحوتب الرابع في بلاد النيل، والتحارير مكتوبة بالأكادية وهي اللغة الدولية في ذلك العصر، غير أن تحريراً واحداً كتب بالحورية لغة الدولة الرسمية فيما بعد، وأن اللوحة الفخارية التي اشرنا إليها في بداية الحديث، والتي كتب عليها اسم الملك توبكيش والملكة أوكنيتوم، لم تكتب بأي من اللغتين الأكادية أو الحورية بل كتبت باللغة المسمارية الأقدم، وذلك أن هذا الاكتشاف قد زاد من عمر الحضارة الحورية تاريخياً ألف عام، يعود تاريخ الحوريين إلى ١٥٠٠ ق.م تاريخ نشأة المملكة، بينما توضح النقوش المسمارية

١ الاصح القول ان تل موزان يقع بين راس العين ونصيبين

٢ ياقوت الحموي.. معجم البلدان.

الختم الذي يحمل اسم الملك /نارام سين/ كان بوصل ٢٤ كسرة وقطعة، و قد كانت بعض الأختام ملصقة بأبواب دلت على أنها كانت تستخدم محلياً، و ليس للبضائع المستوردة و هنا بدا التساؤل واضحاً وطارحاً نفسه ما علاقة نارام سين باوركيش و الحوريين حتى جاء اكتشاف ختوم و طبعات أخرى كتب عليها اسم (تارام أكاد) ابنة الملك نارام سين.

هذه الأختام أزاحت للبعثة الشيء المعتقد والمتعلق بالملكة الأكادية القديمة، فبعد قراءة النقوش الأخرى، تبين بأن /تارام أكاد/ كانت تلعب دوراً سياسياً أو ربما لاهوتياً، بإقامتها الدائمة في اوركيش، أي أنها لم تأت إلى اوركيش إلا تحت ظروف موأنية لها كزوجة خاصة ل(اندن) أحد الأمراء الحوريين، كزيجات ضمن الأسرة الحاكمة كما كان متعارفاً عليه، فنارام سين نفسه كان قد تزوج من ابنة الملك (ايلام).. فكان وجود /تارام اكاد/ في بلاط اوركيش، صورة متطورة ومتعمدة لتذكير اوركيش بالحكم الاكادي المسيطر، وضرورة الانصياع التام للأكاديين.

و يذكر أن معنى اسم تارام اكاد هو محبة أكاد، و هو لقب حملته لأعمالها الشعبية و السياسية، إضافة إلى هذه الأختام و الطبعات، فقد عثر على تمثال قرميدي هام وجد في حفر إحدى الغرف، وفي نفس الحفرة، وجد أيضاً عدد من الأواني المحطمة، وتمثال قرميدي لامرأة عارية، ومن المكتشفات موقد أو مصطلي كبير مزخرف على ما يبدو برموز دينية من الخارج، تشير إلى نشاط ديني في هذه البقعة. ففي تلك الازمان كانت النفوذ والاتصالات تتم عبر زيجات وقرابة نساء.. بالمصاهرة على الاغلب، ولكن قد تكون ايضاً بصفة كاهنة دينية.. وسفيرة متوازنة. ■

الكاتب:

رضوان محمدا مين محمد مواليد ١٩٧٢

اجازة في التاريخ من جامعة دمشق.

له كتابان:

١- القصة القصيرة في الجزيرة السورية.. مختارات

٢- حوارات: Çira Geş

ينشر في المجالات والدوريات المحلية.

على بناء آخر صغير كان بمثابة ملحق للقصر، تعتقد البعثة الأمريكية المنقبة بأنه مبنى جنازي أو ما شابه ذلك، أي أنه كان مخصصاً لبعض الطقوس الدينية الموجودة في تلك الفترة، ويتكون هذا الملحق من ثلاثة أقسام كان القسم الأول هو قسم الدخول، و القسم الثاني عبارة عن غرفة مربعة الشكل، يعتقد أن هذا القسم كان على شكل جملون، ودرج هذا الاعتقاد من خلال العثور على أحجار بجانب التل بطول ٢ متر وعرض بحدود ٦٠ سم وسماكة ١٠ سم، مشكلة بذلك السقف في هذا القسم. أما القسم الثالث فهو بشكل دائري يصل عمق القسمين الثاني والثالث الى أربعة أمتار ونصف، بُني هذا القسم من الحجر الأبيض، وبدا سقف القسم الثالث بأنه كان على شكل قبة، وذلك من خلال الحالة الإنشائية لاستمرارية ارتفاع الجدران التي لا تزال محتفظة بحالتها الطبيعية القديمة.

وفي عودة إلى شرح القسم الأول الذي كان واضحاً بأنه مخصص لعملية الدخول إلى هذا المبنى فقد كان يتم عبر مدخل صغير جداً بعرض ٥٠ سم، يتم النزول إليه من خلال درجات بعرض ٢٥ سم وارتفاع ٤٥ سم، وطبعاً في هذا غرابة واضحة في المقاسات.

أختام تارام أكاد :

كان القصر مليئاً بمجموعة من النقوش التي وصل عددها إلى ما يقارب ألفين وحدة نقشية.. إضافة إلى مجموعة من طبعات الأختام بلغ عددها ١٤٤ طبعة، وهذه الأختام وجدت في الديوان، بعض هذه الأختام كان غير مفهوم بإشارته، و يعود السبب لعدم القدرة على رؤيتها وقراءتها بوضوح خلال المعالجة و التنقيح من قبل البعثة لتأكلها الزمني، و يذكر رئيس البعثة في إحدى مذكرات البحث :

إن أكثر الرموز أهمية في الختوم جاء اكتشافه في الأيام الأخيرة من الحفر الأثري، وهو ختم يظهر عليه اسم / نارام سين/ ملك الأكاديين، وقد فضلنا الاستمرار في الحفر للحصول على أختام أخرى من نفس المكان، وفي أربعة أيام حصلنا على /٢٠٠/ شظية وكسرة قادتنا إلى إعادة بناء النقش الكامل للختم، و الحصول على لمحة عن العديد من الأختام الأكادية الجميلة ، وبإعادة بناء

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

Sala 1997' an li gundê Soxanekê Şêrewa- Efrînê ji dayîk bûye

Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe Soxanekê xwend, ya amadeyî jî li gundê Aqîbê û ya navendî li bajarê Efrînê xwend

Sala 2015'an derbasî Zanîngeha Efrînê bû beşa Ziman û Wêjeya Kurdî, lê mixabin bo rewşa şer û dagîrkirina Efrînê nikarî bû xwendina xwe li Efrînê bi dawî bike lewra çû bajarê Qamişlo li Zanîngeha Rojava jî salekê xwend û di sala 2019'an de ji zanîngehê derçû

Berhem:

Roman: Berxwedanistan

Çîrok: Rengên Êşan

- Çîroka we û nivîsandinê çawa destpê kir, û çima we berê xwe da vî warî ?


- Bi rastî hezkirin û meraqa min di çûkaniya min de li ser nivîsandinê hebû ji ber ku min di çûkaniya xwe de pirtûk dixwendin û didît ku ew me derbasî jiyanêke din dikin û nivîskar dikarin bi riya pênûsê re ramanên xwe bi gelek kesan re parve bikin. Dema ku ez derbasî Zanîngeha Efrînê jî bûm hîngê pirtir meraqa nivîsandinê bi min re çêbû û min berê xwe daye vî warî ji bo gelek sedeman yekemîn sedem û yê sereke ku hezkirina min gelekî ji pirtûkan re tê û min xwest weke xwendekareke zimanê Kurdî xizmetekê bo zimanê xwe pêşkêş bikim.

-Wek tê zanîn hûn keça nivîskarekî naskirî ne, gelo rola bavekî weha di afirandina keçeke nivîskar de çuqas bi bandor e, derbarê vê têkiliyê hûn çi dikarin ji me re bibêjin ?

MÎDIYE BEREKAT:

"Wek buhişteke bibe doje û agirek bi baskên çûkekê bikeve, yan li buharekê nişka ve payîz were û dar ji pelên xwe tazî bibe, ev êş jî wek pêlên deryayekê ye ranaweste ta em vegerin Çiyayê Kurmênc û çavên xwe bi keskahiya wê bixemilînin."





- Bi xwe bavê min ew mamosteyê min yê yekemîn e ku dema hîn ez biçûk bûm bi dizî li mal zimanê Kurdî fêrî me dikir, ew bû yê ku ji min re got divê ez derbasî Zanîngeha Efrînê bibim û ziman û wêjeya Kurdî bixwînim. Destpêkê dema ku min tiştek wek helbest yan çîrokekê binivîsanda bang min dikir û digot li vir wisa şaşî heye sererast bike yan nêrîna xwe dida min û ta niha jî wisa ye.

Helbet jî hezkirina xwendin û nivîsandinê min ji bavê xwe bir ji ber ku ew hertim li ber pirtûkxaneya xwe bû dixwend yan dinivîsand û hertim şîretan li me dike ku zimanê me hebûna meye û bi xwe yekemîn pirtûka min di şerê Efrînê de dema min dît ew dinivîsîne tevî ku rewş şer e meraqa min jî çêbû û min xwest romanekê ser Efrînê çêbikim û hertim bavê min alîkarî, pêşgirî û coş dida min û ta niha jî wisa ye.

- Nivîsandina romanekê di temenekî wisa biçûk de bi xwe pozberiyê mezin û wêreyê berçav e, ev proje çawa li cem we destpê kir ?

- Di şerê Efrînê de wek li jor jî min got ku bavê min dinivîsand û min dît her Efrîniyek bi awayekî şer dike û berxwedaniyê dike min jî tu rê li pêş xwe nedîtin rabû min got ezê vê gavê bavêjim û bila ew bibe destpêk. Bi xwe romana min Berxwedanistan ez dikarim bibêjim ew hemû bûyerên bi êş ku hatine û

têne ser Efrîniyan û Efrînê min tê de nivîsandine.

Wêrekiya ku ez romanekê di vî temenî de binivîsim helbet dijwar bû li min lê min xwest ez hovîtiya ku dewleta Tirkîyê û terorîstên wê tînin ser Çiyayê Kurmênc û xelkê wê ji cîhanê re bidim xuyakirin û ew werin belgekirin ta nîfşên bê bizanibin ku çiqas dijminê me pîs e û çiqas Efrîniyan berxwedanî kir û hîn ser wê riyê berdewam dikin.

Helbet jî piştî min ew bi dawî kir bavê min lê vegerî û hin têbînî didan min û wî coş da min ku ez wê çap bikim.

- Tu keçeke efrînî yî, çawa wî bajarî dikarîbû nivîskarekê ji te çêbike, wî cihî çuqasî bandor li nivîsên te kiriye û cihê xwe di nav girtiye?

- Rola bajarê me Efrînê, Çiyayê Kurmênc û çiyayên wê bandor li min kirin ku ez xwezaya wê ya kesk û xemla wê ya buharî têxim nivîsên xwe. Efrîn ji her tiştî ve zengîn e weke dar, çem, çiya û cihên wê yên dîrokî û gava ew hate dagirkirin ji hêla dewleta Tirk ve min xwest di romana xwe de wek du tabloyan bidim xuyakirin ku berê Çiyayê Kurmênc hertim keskahî bû û piştê ku niha dewleta Tirk çî tîne serê wê û xelkê wê.

Bandora Çiyayê Kurmênc di warê hezkirina zimanê Kurdî de gelekî li min kir ji ber ku hemû xelkê xwe bi zimanê dayîkê daxivin û li salên dawiyê dibistan, peymangeh û zanîngeh bi zimanê Kurdî lê vebûn ku hertişt bi Kurdî bû lawra min bi Kurdî dest bi nivîsandinê kir.

- Di derbarê ezmûna we ya kurt de di warê nivîsandin û wêjeyê de, we çî astengî dîtine, derbarê vê ezmûnê de hûn dikarin çî ji me re bibêjin ?

- Helbet astengî hebûn yek ji wan jî yê çapkirinê ye ji ber ku gelek çapxane hene bi riya pereyên pir pirtûkan çap dikin û dem diçe ta pirtûkek were

çapkirin. Lê di warê nivîsandinê de ewqas astengî min nedîtin ji ber ku romana min hemû ser Efrînê bû û helbet wek keçeke Efrînî ez warê xwe baş nasdikim û mamosteyê min jî bavê min bû. Lê niha astengî di warê jiyanê de heye ku ne ew jiyanê aram e ku yek binivîse ji ber ku koçberî diware û bi rastî piştî dagirkirina Efrînê gelek pirsgerêk di jiyanê me de çêdibin ji ber ku aramî nîne, war ne warê me ye, em ji hemêza Efrînê dûr in û êş pir bûne.

-Berhemên we ta niha çi hene û ji bo siberojê çi projeyên we yên wêjeyî hene?

- Berhemên min romana Berxwedanistan ya ser şerê Efrînê û berxwedaniya Efrîniyan e li çapxaneya şilêr sala 2019an de hate çapkirin û pirtûkek yê çîrokan bi navê Rengên Êşan ew jî li Almaniya ji aliyê çapxaneya SerSera sala 2020an de hate çapkirin û di demek nêz de ewê li Qamişlo çapxaneya Şilêr jî were çapkirin.

Bo pêşerojê jî helbet çîrok li ba min hene ez kom dikim û dema Efrîn nêz de were rizgarkirin û em bi hêviya wê rojê ne ez hez dikim beşek din ji romana Berxwedanistan binivîsim ku dawiya xwe veeger hebe û piştî berxwedaniyê em veegerin buhiştê xwe.

-Bi qasî we şopandiye, hûn rewşa wêjeya kurdî çawa dibînin, û ji bo pêşxistina wê çi pêwîst e?

- Rewşa wêjê û zimanê Kurdî helbet niha ji dema berê baştir e ji ber ku niha dibistan, peymangeh û zanîngeh bi zimanê Kurdî hatine vekirin û xwendekar bi azadî fêrî zimanê xwe dibin. Li pirtûkxaneyan pirtûkên bi zimanê Kurdî hene ew ne wek berê binerdê de têne veşartin ji ber ku berê ew qedexê bûn. Azadiya niha wêjê pêş xist ku gelek nivîskar bêtirs bi zimanê dayîkê dinivîsin, çapxane û pirtûkxaneyên Kurdî hatine vekirin û hezkirin ba xelkê Kurdî heye ku ew wêjê û zimanê xwe bixwînin.

Ji bo pêşxistina zimanê Kurdî helbet divê wergerandin hebe sazî çêbibin bo pirtûkan wergerînin ta bi hemû zimanên din ji xelkê re wêjeya me bidin naskirin, pirtûkxane hîn pirtir bin û bo parastina

wêjeya me ya filklorî kesine zanist di vî warî de bi pêşgiri li hemû deverên Kurdistanê bigerin û wêjeya wê ya filklorî kom bikin ta were parastin. Kesên gelek di warê zimanê Kurdî de xebitîne li ba hev bicivin û yek rastnivîsa Kurdî derxin û gelek sazî çêbibin û tenê xizmetî zimên bikin wek çêkirina ferhengeke ku hemû peyvên Kurdî tê de bin.

- Em hemû ji ber rewşa Efrînê û tawanên ku ji hêla dagîrkeran lê têne kirin diêşin, her weha rewşa derbiderbûna xelkên me yên efrînî bi xwe êş û azariyeke berdewam e. Çendî em bibêjin em nikarin bigihêjin asta hestên xelkên wê û hûn yek ji wan in... tu wekî nivîskareke efrînî çawa dikarî ji me re vê êşê debirrîni?

- Êşa dûrketina me ji Efrînê û dagirkirina wê tu carî em nikarin baş bidin şayazkirin ji ber ku tu peyv yan hest têrê nakin weke ku çêbûye. Wek buhiştêk bibe dogeh û agirek bi baskên çûkekê bikeve yan li buharekê nişkav ve payîz were û dar ji pelên xwe tazî bibe ev êş jî wek pêlên deryayekê ye ranaweste ta em veegerin Çiyayê Kurmênc û çavên xwe bi keskahiya wê bixemilînin.

Niha her Efrîniyek sed keserên xwe hene, nîvê wan li penagehan ser pakrewanên xwe de digrîn ku dijmin ta gorên wan jî xerab kirine. Pîrsek ser zimanê hemû Efrîniyan heye ew jî ev: Emê kengî veeger in?

Bersiv tune ev jî wek pizotek ku ser laşê mirovekî were dayîn, xelkê Efrînê li Şehba bêt xwedî ne tu kes li wan napirse bûne sêwiyên bêt dê û bav lê tucarî hêviyên wan naşkên û ev bû sê sal in tevî diwariyên jiyanê li ber xwe didin ta veegerin. Çiqas bibêjim ku birîna me vekirîye û hertim pirtir û roj bi roj em bi xweşî dimirin ez nikarim yek ji hezarî vê êşê şayaz bikim û tu kes jî nikare ji ber ku ew gelek giran e.

- Gotina we ya dûmahîkê ?

- Em bi hêviya veegerê ne ku em û xelkê Serê Kaniyê veegerin warê xwe û çiqas ji me têt xwestin em xizmetî zimanê xwe bikin emê kar bikin ji ber ku armanca dijmin em dest ji zimanê xwe berdin lê emê qet armanca wan pêk mînin. Li dawiyê spasiya we dikim. ■

ŞÊX SEÎDÊ PÎRANÎ (1865 – 1925)

Navê wî Seîd kurê Mehmûd kurê Şêx Elî ye, li devera Palo ya bakurê Kurdistanê di sala 1865an de ji dayik bûye. Ew kurê malbateke oldar û serkêşa rêgeha Neqşebendî ye, ev rêgeha sofitîyê li Kurdistanê bi rengê berfireh belav bûbû û gelek peyrewên wê hebûn.

Feqîtiya misilmantî xwend, û piştî koçbûna bavê wî, ew bûye rêberê rêgeha neqşebendî li Paloyê.

Şêx Seîd yekemîn serokê kurd bû ku bi şoreşê çekdarî li dijî desthilatdariya Ataturk ve rabû. Û doza mafê netewî yê gelê kurd kir.

Şêx Seîd kesayeteke xurt û naskirî bû, û hemû xelkên deverê jê hez dikirin. Di heman demê de ew xwedî hestekî mirovî û kurdeperwer bû.

Jiyana wî ya siyasî:

Ji sala 1908an ve derbasî warê siyaseta bû, di wê demê de kurdan dest bi avakirin û damezirandina komeleyên siyasî, civakî û çandî kiribûn. Mîna (Kurd Tealî û tereqî-komeleyên civakî, kovara Hêvî). Di riya kurê xwe Elî re pêwendî bi rewşenbîrên kurd ên li Stembolê re dikir.

Di sala 1914an de Mîr Ebdirezaq Bedirxan xwediyê kovara Hêvî nameyek ji Şêx Seîd re şand û jê xwest ku pêwendiyê bi serdarên kurd ên leşgerî li eniya Qewqazê bike û ji wan bixwaze ku ji eniyên şer ên wilayetên Wanê, Mûşê, Erzerûmê û Hekariyê vekişin. Û jê re da diyarkirin ku Rûsan soz dane ku wan deveran radestî kurdan bikin. wê gavê Şêx Seîd li gel Şêx Ebdiselamê Barzanî çûn û alîkarî ji hikûmeta qeyserî ya rûsî xwestin.

Dema ku agahî ghişte tirakan bi riya hin serokeşîrên kurd re, xwestin ku şêx Seîd ji kurdistanê dûr bixin.

Piştî xapandina Ataturk ji kurdan



re û piştî rakirina peymana Sîverê û imzekirina peymana Lozanê ya ku danpêdanê bi mafê kurdan nake, karê destpêkirina şoreşê hate kirin.

Karê wî yê leşgerî:

Di sala 1924an de, serokatiya komeleya Azadî kir, vê komeleyê biryar da ku bi bizaveke leşgerî ya berfireh li dijî desthilatdariya dewleta tirk ve rabe, armanc jê bidestxistina mafê netewî yê gelê kurd bû. di encama girtina çend serdarên komeleyê şoreşê berî dema ku jê re hatibû pîlan kirin (berî buhara 1925an) destpê kir, û şer li 14 wilayetan belav bû. derdora 600 hezar çekdarên kurd li gel hin komên ermen, çerkes, ereb û asûriyan beşdarî di şoreşê de kirin, û dikarîbûn gelek serkeftinên leşkerî û deskeftinan qezenc bikin, û bajarê Amedê dorpêç bikin.

Girtin û sîdarkirina wî:

Ataturk dikarîbû wê şoreşê têk bibe, û piştî şikandina dorpêça Amedê (Diyar Bekrê) . Şêx Seîd hewil da ku xwe û şervanên xwe xelas bike û vekişe, lê dorpêça artêşa Ataturk pir asê bû û dikarîbûn wî bigirin.

Di 30 gulana 1925an de li gel 47 serkirdeyên şoreşê, Şêx Seîd hate sîdarkirin.

Şêx Seîdê Pîranî û şoreşa wî, di dîroka gelê kurd de rûpeleke ronak e û nemûneya berxwedaniyê gelê kurd e. ■

Li Heseke .. Kirîza Kehrebê

Rapor: Kovara Welat

Ji destpêka krîza Sûriyê ve, û di encama şer de gelek ziyan gihişte jêrxana vî welatî. Yek ji wan hêmanên jêrxanê kehrebe bû. gelek êzgehên kehrebê rastî wêranîyê hatin, yan jî ketin jêr destên hêzên çakdar ên radîkal de mîna Cebhut Alnusre, Daiş û xeynî wan, di encamê de gelek alav û amûrên girêdayî kehrebê hatin dizîn yan jî rastî xerabkirinê hatin. Di heman demê de jî hikûmeta desthilatdar ev alî piştguh kir û bi şerê parastina xwe ve daket.

Wek tê zanîn, kehreba reha jiyana mirov ya serdemî ye, û ji bo jiyana wî pêdivîyeke girîng û sereke ye. lewra welatîyên Sûriyê li awayên berdêl bo peydekirina kehrebê geriyan, her devereke li gorî derfet û imkanên xwe.

Li devra rojavayê kurdistanê û deverên rêveberiya xweser, û ji ber peydabûna neft û mazotê ceneratorên elektrîkê hatin danîn, yan jî (kehreba empêran) weke tê bi nav kirin derket holê.

Li her taxekê generatorek hate danîn, ew jî cenetorên taybet bûn, ango ji hêla welatîyekî dihatin danîn û şuxilandin, lê mazot û sotemenî ji alî rêveberiya xweser ve bi buhayekî erzan ji wan re dihat pêşkêşkirin û tabînkirin. û her empêrek buhayek wê ya destnîşankirî heye.

Tevî ku gelek pirsgerêkên van ceneratoran û xwediyên wan hebûn, ji wan pirsgerêkan; dengê wan yê nexweş û domana wan ya



ku ziyanê digihîne tenduristiya welatîyan, her weha pirsgerêkên xerabûna wan ya berdewam û fişarên ku xwediyên wan li beşdaran dikirin bo buhakerina nîrxê empêran û gelek pirsgerêkên din, lê van ceneratoran ta radeyeke baş pirsgerêka kehrebê li deverê çareser dikir û pêdiviya xelkên deverê ji kehrebê peyda dikir.

Di dema dawî de, û bi taybetî li bajarê Heseke, gelek ceratorên kehrebê rawestîyan û ji kar ketin, û xwediyên wan ew ji taxan rakirin bêtî ku berdêlekê li şûna wan peyda bikin, vê yekê hişt ku bi sedê malan ji kehrebê bêpar bimînin, nexasim ku rewşa kehreba fermî pir nebaş e û di rojê de incix sê-çar seetan tê.

Kovara Welat ev pirsgerêk û badora wê li jiyana welatîyan ji nêz ve şopand.

Li gorî şopandinê derdora 15 ceneratoran li taxên bajarê Heseke ji kar ketine, û eger em bibêjin ku her yeke ji wan herî kêr xizmeta 100 malî dikir, ev tê wateyê ku derdora 1500 malî ji kehrebê bêpar mane.

Li taxên Salihiyê, Miftî û Ezîziyê gelek mal di nava tarîtiyê de jiyan dikin, û gelek zehmetiyan dikişînin.

Hin mal, ev derdora salekê di nava vê rewşê de ne, û li hêviya çaresriyekî ne.

Li şaredariya Hesekê komîteyek taybet bi karûbarê ceneratoran heye, karê vê komîteyê ew e ku karên van ceneratoran birêxistin bike û pirsgrêkên wan çareser bike, dema şuxilandina wan û buhayê empêran destnîşan bike û çavdêriyê li karên wan bike.

Lê gelek pirsgrêk ji aliyê vê komîteyê tene piştguhkirin, û nayên çareserkirin.

Ev welatiyên ku ji mehan ve bê kehrebe mane dipirsin: Gelo kî wê vê pirsgrêkê çareser bike, û ta kengî em ê di nav tarîtiyê de bimînin? ■





حركة بناء غير مسبوقة و غلاء فاحش في أسعار العقارات

تقرير مجلة ولات

تشهد

مناطق الادارة الذاتية في شمال و شرق سوريا حركة بناء غير مسبوقة فخلال السنوات الأخيرة تم تحديث حوالي ٧٠٪ من الأبنية السكنية و مازالت حركة البناء مستمرة بزخم كبير حيث نجد في كل حي و شارع عشرات البنايات المستحدثة أو قيد البناء مع استمرار غلاء أسعار الشقق و العقارات.

هناك عدة أطراف مساهمة في هذه الحركة العمرانية ابتداء من متعهدي البناء مروراً بالمكاتب العقارية و تجار العقارات و تجار مواد البناء و وصولاً لأصحاب البيوت و العقارات . للدخول الى تفاصيل هذه الحلقة و أسباب حركة البناء هذه و من يقف خلف غلاء أسعار العقارات و التحكم بها التقينا بعض الشرائح المساهمة في هذه الحركة في مدينة الحسكة و أعدنا هذا التقرير.

يقول السيد آلا فاطمي و هو صاحب مكتب عقاري أن حركة البناء تعتبر حالة حضارية تساهم في تغيير الوجه الحضاري للمدينة و تأمين احتياجات السكن لعدد كبير من العوائل، فالأبنية القديمة كانت أفقية و بالتالي كان حجم العقار كبيراً لكنه لم يكن يلبي احتياج السكن سوى لعائلة واحدة فقط ، و معظم هذه الأبنية كانت قديمة بسبب الحالة المادية الفقيرة بشكل عام لسكان المنطقة، أما الأبنية العمودية فهي توفر سكن لأعداد مضاعفة من السكان، فالعقار الذي مساحته ٢٠٠ متر مربع مثلاً يتم تحويله الى ٨ شقق سكنية .

و حول سبب حركة البناء قال السيد آلا بأن تدفق رؤوس الأموال من الخارج و خاصة من المغتربين و ظهور طبقة بورجوازية في الداخل إضافة الى بعض التقارير التي تبشر بمستقبل زاهر للمنطقة ساهم في استثمار هذه الأموال في مجال العقارات و الذي يعتبر أكثر المجالات درا للأرباح و لا يخلو الأمر من بعض عمليات غسيل الأموال نتيجة تجمع أموال طائلة في أيادي البعض بطرق غير مشروعة.

و حول التحكم بالأسعار قال آلا بأن هناك عدة أطراف تقف خلف ذلك و هي أشبه بمافيات فهناك بعض أصحاب المكاتب العقارية الذين يتاجرون بالعقارات عبر عمليات أشبه بالاحتيايل و بمشاركة بعض تجار العقارات و يقومون بالتحكم بأسعار العقارات لجني أكبر قدر من الأرباح و غالباً ما يكون ذلك على حساب المواطنين الذين هم حقيقة بحاجة للسكن أو على حساب أصحاب البيوت الذين يضطرون لبيع بيوتهم نتيجة الحاجة. بالمقابل هناك من يحتكر و يتحكم بأسعار مواد البناء فيستوردونها بثمان رخيص و يبعونها بأسعار مضاعفة و خاصة مادتي الأسمنت و الحديد. إضافة الى الرسوم الجمركية على المعبر و التي تؤدي الى مضاعفة سعر المواد أيضاً.

من جهة أخرى فإن هذه الأبنية لا تخضع للرقابة من قبل البلدية ، فالبلدية تمنح رخص البناء و لكنها لا تتابع المواصفات الهندسية ، فيتحكم المتعهدون بنسب المواد و المواصفات و هذا ما أدى الى انهيار بعض الأبنية و قد يؤدي الى انهيار أخرى في المستقبل.

و حول السبب الذي يدفع أصحاب البيوت و العقارات للتعاقد مع المتعهدين يقول السيد أبو زكريا : أنا موظف و دخلي محدود و ليس لدي أي رأس مال ، لا أملك سوى بيتي و ليس لدي الامكانية لاعادة بناء عموديا ، فاضطرت للتعاقد مع متعهد مناصفة لأحصل على

شقتين أستطيع استثمارهما بحيث أؤمن معيشتي بهما.

و يقول السيد أبو محمد و هو أيضا صاحب بيت تعاقد مع متعهد بناء بأن هدفه هو تحسين سكنه, فبيته قديم و لا يملك المال لتجديده مما اضطره للتعاقد مع متعهد مناصفة و الحصول على شقة حديثة البناء و مناسبة للسكن.

أما السيد م ج و هو متعهد بناء رفض ذكر اسمه فقال بأن العمل في هذا القطاع هو الأكثر ربحا هذه الايام و قد بدأ العمل برأسمال بسيط و هو الآن يملك الكثير من الأموال و الشقق السكنية , و ذكر بأن صاحب البيت يستفيد أيضا , لكنه اشتكى من عدم ثبات سعر مواد البناء و غلاءها بشكل شبه يومي مما يتسبب له ببعض الخسارة أحيانا و يضطره لرفع سعر الشقق.

جدير بالذكر بأن النسبة الكبرى من الشقق يتم المتاجرة بها بين التجار أنفسهم بمعنى أنها لا تستخدم للسكن بل يتم بيعها على الهيكل من تاجر لآخر , كل واحد منهم يربح مقدارا من المال من الشقة و هكذا تستمر عملية المتاجرة ... و من يراقب الأبنية القائمة حاليا نادرا ما يجد شقة جاهزة للسكن فيها .. أما باقي الشقق فهي على الهيكل و بغرض المتاجرة فقط. فهناك فئة قليلة تستطيع شراء الشقق لأن أسعارها مرتفعة جدا و لا تنسجم مع مستوى دخل الفرد و خاصة بعد حالة الغلاء التي تعصف بالمنطقة. ■



FERHENGOK

bîrkarî	رياضيات
komkirin	جمع +
derxistin	طرح -
hevdanî	ضرب ×
Parvekirin	قسمة ÷
kert	كسر
par	بسط
paran	مقام
yezanî	آحاد
dehanî	عشرات
sedanî	مئات
Hejmarên dehî	الأعداد العشرية
girovekirin	تقريب
rêje	النسبة
Rêjedarî	التناسب
yeksan	يساوي =
kenar	ضلع
Goşe	زاوية
Goşeya tîk	زاوية قائمة
milkêş	مستطيل



مناضل

عمران يوسف

ولد و ترعرع داخل السجن، كانت مساحة حريته مأةرة بحدود زنزانتة، لكنه كان سعيدا و قنوعا بنمط حياته التي لم يألّف غيرها.

قرأ عن الحرية في بعض الكتب التي كانت تسرب إلى داخل السجن سواء بعلم السجان أم على غفلة منه كان يقرأها بشغف و يحلم بتلك الحرية المسطرة على صفحاتها بأحرف ثورية ناصعة .. و في لحظة حماس ثورية قرر أن يتحول إلى مناضل من أجل الحرية فبدأ بتشكيل حزب و عين نفسه رئيسا له و شرع بنضاله الثوري بين السجناء ... علم السجان بذلك عبر أعينه المنتشرة بكثافة بين السجناء فاستدعاه على عجل و سأله : كيف تقوم بتأسيس حزب محظور أيها الأبله ؟

رد المناضل بكل حماسه الثوري : أنا أعشق الحرية يا سيدي و ليس بوسعي إلا أن أناضل من أجلها .

السجان : و كيف ستناضل يا مناضل .. هات اتحفنا ؟

المناضل (مرتبكا) : بكل الأساليب المتاحة يا سيدي .

السجان (بعد لحظة تفكير) : لا بأس تستطيع

ذلك فنحن نعيش في سجن ديمقراطي .. و لكن لا تنسى أن تخطرنا بأساليب نضالك ...

المناضل : بالتأكيد يا سيدي

ذات يوم انهار السجن فجأة و دفن السجان تحت أنقاضه و استطاع عدد كبير من السجناء الفرار ...

لأول مرة وجد المناضل نفسه يعيش خارج السجن ... شعر بفراغ قاتل و بشيء يشبه العدمية ... لم يعد للنضال لون أو طعم أو رائحة ... الشوق إلى أيام نضال العبودية بات يؤرقه و يحرمه هناء النوم ... و لتجاوز هذه الحالة القاتلة قرر بناء سجن و العيش داخله و البحث عن سجان يلهمه النضال من أجل الحرية. ■



D I L S A R Î

ELÎ ÇIL AXA

Derd û kulan ne vejîne kovan a kûr bîranîne
 Mest û sema bi hevalin dûman û qîr û girîne
 Em hemxak û hevsalin çima dewran îro dîne
 Jan û jarî para me ye hemahema em mirîne
 Ta kengî dîl û evdalî bo çi bawerya me nîne
 Bê bend û bê serwerî tovê xweziyê çinîne
 Hewara xwedayê fero ahoramezda bi şîne
 Da saz bike warên berê jiyanê nû bi afirîne ■

نصوص شعرية

فريدة زادة



الحبر

لا اعرف من منا يهمس للآخر

من منا يكتب الآخر...

من يرسم الآخر ويلونه..

هي كلمات..تصفنا...تكتبنا..

ويسيل الحبر..

ينشر ألحانا عذبة

يحيل الألم كلمات

يهطل مطرا على ...صحاري الروح

زخات على المحبين

تنورا للأمهات

خبزا للفقراء

العبا للأطفال

الحبر...

لا ألم يحتويه ...

أمه الخيال

ومسعاها السعادة

.....

لو أنك معي

كنا رقصنا للريح

ودفنا الألم

ولمسحنا الغبار عن جبين الشمس

لتسدل من شعاعها أبجدية جديدة

ولرجعت الأعداد من حيث بدأت

لو أنك معي

لدبت الروح في براقي الخشبي

وطار بنا في الأنحاء

لو أنك معي

كنا ودعنا العام معا

ووقفنا على عتبة الجديد لنستقبله

ونلون أوقاته بالعناقات الطويلة

ورسمنا شغفا للحب والحياة

فقط لو أنك معي

.....

هناك توقفت اللحظة..

حيث كنا

هناك كل شيء جميل..

حيث المكان يدور

والوقت واقف يتأملنا

حامل بالمستقبل أنت

وحامل بك أنا

انتظر ارجوحة السماء

متوسدة قلبك..

اتكئ على بياضه

■ هناك حيث لاشيء سوانا

حياتي الثانية

في حياتي الأخرى..

كنت لي أيضا

كنت حبري وقصيدي

الشجرة التي تظلني وتسندني

كنت ولدي

في إحدى المرات

كنت بحرا....

ودوما غرقت فيك

كنت ملح الأمكنة

وسكر الأوقات

.....



حركة بناء غير مسبوقه و غلاء في أسعار العقارات



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٧٨) ٢٠٢١/٢/١ م